Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1160 14-Nîsan-2024 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com 423165

Pirtûka ‘Jin Jiyan Azadî. Di agirê şoreşa jinên Rojava de’ hat weşandin

Pirtûka ‘Jin Jiyan Azadî. Di agirê şoreşa jinên Rojava de’ ji aliyê Enstîtuya Andrea Wolf a Jineolojî ve hat weşandin.

Di sala 2018’an de komeke jinên enternasyonalîst ên ku li Enstîtuya Andrea Wolf a Jineolojî ya li Rojava kom bûbûn, projeya nivîsandina pirtûkên wekî parçeyekî karên Enstîtu dabû destpêkirin. Li ser vî esasî di nav salekê de hem bi jinên ku bi salan di Tevgera Azadiya Jinên Kurdistanê de cihê xwe digrin hem jî bi jinên ku parçe û pêşengên Şoreşa Rojava ne, bi dehan jinan re hevpeyvîn hatibûn kirin. Wekî encama yekem ya vê projeyê di havîna 2020’an de pirtûka ‘Mujer Vida Libertad. Desde el corazon del Movimiento de Mujeres de Kurdistan (Jin Jiyan Azadî. Ji dilê Tevgera Jinên Kurdistanê)’ bi zimanê Spanî bi weşanxaneya Descontrol Editorial ya Katalunya ya ku pirtûkan li seranserê Spanya belav dike hatibû weşandin. Ji 2020’an û şûn ve pirtûk bi zimanê Îtalî hatibû wergerandin û weşandin. Kar û xebatê tercumantî ya bi zimanê Fransî, Îngilizî û Portekizî berdewam dike. Bi dehan pêşkeşkirinên vê pirtûkê li seranserê Spanya, Katalonya û Welatê Bask, di heman demê de jî li Italiya hatine kirin. Bi sedan jinên enternasiyonal ev pirtûk wekî çavkaniyeke esasî ya bi zimanê xwe ya ji bo naskirin û kûrbûyîn di derbarê dîrok û îdeolojiya Tevgera Jinên Kurdistanê de dibînin û bi vê pirtûkê bandor bûn. Bi dehan komên xwendinê, nîqaş û xwe perwerdekirin pêk hatin û pêk tên. Ji 2022’yan û şunde vê pirtûkê sînorên Ewropa jî derbas kir û li aliyê din a okyanusê, destpêke li Ekvador û herî dawî di Adarê 2024’an de li Kolombiyayê jî hat weşandin.

Niha, piştî 6 salan carek din bi Descontrol Editorial bi weşandina beşa duyemîn ya pirtûka bi navê ‘Jin Jiyan Azadî. Di agirê soresa jinên Rojava de’ ev proje bi dawî bû. Vê carê, ji bo parastina zimanê Katalanî û misogerkirina xwendina bi vî zimanî, pirtûk bi zimanê Katalanî hat weşandin, wê di Payizê de bi Spanî jî çap bibe.

Piştî bingeha dîrokî û îdeolojik ya ku di pirtûka yekemîn de hat dayîn, di vê pirtûka duyemîn de bingeha şoreşa jinên Rojava çi ye, şoreşa Rojava çawa dest pê kir û çawa pêşve çû, jiyana jin û gelan çawa daye guhertin, û di her qada jiyanê de (xweparastin, aborî, tenderustî, politîk, diplomasî, ciwan, civak, edalet, çapemenî hwd) jin çawa xwe birêxistin dikin di vê pirtûkê de cih girt. Her wiha, di dawiya pirtûkê de biyografiya şehîdên şoreşa Rojava ya ku di pirtûkê de tên behskirin ji bo danasîna wan hatin nivîsandin. Wekî di destpêka pirtûkê de tê xwendin ‘ev pirtûk ji bo bîranîna bi hezaran hevalan ku bi agirê şoreşê re xwe helandin e’. Wekî perperokên di lêgerîna heqîqetê de...

Her wiha, pêşgotina pirtûkê ya ku ji aliyê Enstîtuya Andrea Wolf ve hatî nivîsandin, wiha ye: “Em weke tevgera azadiya jinên Kurdistanê, ji tecrubeya xwe, giringiya naskirina dîroka xwe li hemberî şîroveyên dagirker û baviksalar ku me vedişêrin û me parçe dikin dizanin. Em pêwîstiya hilweşandina qalibên fikir û zihniyeta ku dagirkerî û baviksalarî ferz kirine bi pêşxistina fikir û zanebûnek azad, girêdayî dîrok û rastiya xwe, dizanin. Ev pirtûk di vê rêyê de dixwaze bibe alîkar. Bi salan e, jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê komun, meclîs, akademî û koperatîf ava kirine. Di her eniyê de ji bo parastina civakeke azad şer kirine. Di vê pirtûkê de gelek jinên cuda, dayik, xwendekar, karker, şervan, hunermend, rewşenbîr, jin û gelên cuda tecrubeyên xwe ya li ser jin çawa xwe birêxistin kirine, xwe perwerde kirine û saziyên xweser avakirine ji bo pêşveçûna şoreşa jinê parve kirine. Ev pirtûk utopyayeke dûr şîrove nake, lê tecrubeyên şênber ji dilê jiyanê ve nîşan dide. Pirtûkek li ser jiyanê di vê pevajoya şoreşgerî de ye. Bi hemû xweşikbûna xwe û rihê xwe yê şoreşgertî, bi hemû zehmetiyên xwe, nakokiyan û windahiyên bi êş, bi hemû serkeftin û hêviyên xwe. Çîrokên jiyan û têkoşîna ku rojane tê jiyankirin. Ji ber vê yekê ev pirtûk parçeyekî nivîskî ya dîrok û ya dema niha ye.”

Bi vê pirtûkê tê destnîşankirin ku şoreşa Rojava di esasê xwe de şoreşa jinê ye. Di navbera 6 û 19’ê Gulanê de wê ev pirtûk li 13-14 bajarên cuda yên welatên katalan (Katalunya û herema Valencia) wê ji aliyê endameke ji koma amadekariya pirtûkê ve were pêşkêşkirin.

Jiyana Abdullah Ocalan bû xêzeroman

Têkildarî jiyana Rêberê PKK’ê Abdullah Ocalan xêzeroman hat amadekirin. Xêzeroman dê li gelek zimanan were weşandin û danasanîna wê bi boneya 75’emîn salvegera jidayikbûna Abdullah Ocalan di 4’ê Nîsanê de li Berlînê û her wiha li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate kirin.

Jiyana Rêberê PKK’ê Abdullah Ocalan ku 25 sal in li Girava Îmraliyê di nava şert û mercên giran ên tecrîdê de tê ragirtin, weke xêzeroman hat amadekirin. Nivîskariya xêzeromana bi navê “Dê Azadî bi ser keve - Bi Xêzan Jiyana Abdullah Ocalan” ji hêla nivîskarê xêzeromanan ê îskoçyayî Sean Michael Wilson ê li Japonyayê dijî ve hate kirin û xêz jî ji hêla xêzkarê kurd Keko ve hatine kirin ku li Spanyayê dijî. Xêzeroman dê ji ewil bi zimanên kurdî, almanî û tirkî û jî were weşandin û piştre jî dê bi zimanên inglîzî û erebî bê çapkirin.

Xêzeroman ji 160 rûpelan pêk tê û danasîna wê dê bi boneya 75’emîn salvegera jidayikbûna Abdullah Ocalan di 4’ê Nîsanê de li paytexta Almanyayê û gelek deverên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate kirin.

Fikra wê aydê nivîskarê Îskoçî ye

Endamê Înîsiyatîfa ji Abdulla Ocalan re Azadî, ji Kurdistanê re Aştî ya Navneteweyî Reimar Heider da zanîn ku ev fikr 3 sal berê ji hêla nivîskarê xêzeromanan ê îskoçî Sean Michael Wilson ve hat kirin û proje jî wisa dest pê kiriye. Heider, wiha got: “Sean Michael Wilson got ku ew dixwaze vê biyografiyê weke xêzeroman binivîse. Em jî erênî nêz bûn û dê cara ewil biyografiya Abdullah Ocalan weke xêzeroman bihata amadekirin. Me jî dest bi xebatên xwe kir. Ji bo kesên dixwazin Ocalan nas bikin ev xebatekî girîng e.”

Sudoku: Bersiv 72

5	8	3	1	7	4	6	2	9
2	1	4	5	6	9	7	8	3
9	7	6	2	8	3	4	5	1
4	5	7	8	3	1	9	6	2
3	6	9	4	2	5	8	1	7
8	2	1	6	9	7	5	3	4
7	9	8	3	1	6	2	4	5
6	3	5	7	4	2	1	9	8
1	4	2	9	5	8	3	7	6

Sudoku:Pirs 73

5	9	7		3		2		1
3			2				8	
8	2						7	
				2				6
			8		3			
1				9				
	6						1	7
	7				4			2
4		1		8		5	6	9

FERHENGA BIWÊJAN

Çiraya li ber kora ye, mastê li ber sa ye:
- Bi heman wateyê.
Entîke ye:
- Tiştên pir ecêb dibêje; tiştên ne di cih de dike; tiştên ne di cih de dibêje.
Ya ji bûkê kêm, du pil bixûr in:
-Tişta tu dixwazî hem ji me nayê, hem tişteke beredayî ye.
Zêdegaviyan dike:
- Tiştên ne di cih de dike; gotinên ne di cih de dibêje.

LI SER AXAFTINA LI SER GELEK TIŞTAN

Ji al û palên dinyayê axivîn:
- Tiştek nema ku li ser neaxivîn.
Ji aş û bajêr axivîn:
- Behsa gelek tiştan kirin; tiştek nema ku behsê nekirin.
Ji aş heta bajêr li ser her tiştî axivîn:
- Bi heman wateyê.
Ji ka û zar kir:
- Ta bi derziyê ve kir; her tişt bi berfirehî got.
Xwediyê çêlekê ji xwediyê kerê havên xwest:
- Ji bo kesê karê bêwate dike tê gotin.

LI SER BÊHÊVÎBÛNÊ

Destvala çû:
- Tişta hêvî dikir bi dest neket.
*Ji bo agahiyan hatibû, lê destvala çû.
*Ji bo pereyan hatibû, lê destvala çû.
Devê xwe bi xêrê venake:
- Bêhêvî bûye; baweriya wî nemaye; tiştên xirab ku wê biqewimin dibêje.
Devê xwe ji bo xêrê venake:
- Bi heman wateyê.
Dûrî serê te ye:
- Tişta tu dixwazî tu pê şa nabî.
Ji destê wî derket:
- Êdî ne xwedî ye; têkiliya wî pê re nemaye.
Ji destê xwe revand:
- Ji destê wî derket; nebû qismetê wî.
Ji serê xwe avêt:
- Hêviyên xwe birîn; li pey neket; xwest ji bîr bike.
Ji qantirê re gotin, wê kurekî te çêbe, giriya got, ez pê şa nabim.
- Qantir dizane ku avis nabe.
Li ser bixwîne/lê bixwîne:
- Ji destê te derket çû, êdî li pey nekeve; êdî mirî hesab bike.
Pişta stûyê xwe xwerand:
- Destvala hat; tiştek bi dest neket; bi ser neket; weke daxwaziya wî nebû.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Dayika Uweyş îlhama têkoşîna azadiya jinên Kurd bû

Dayika Uweyş dibistana destpêkê ya Rêber Apo bû, wê berhemekî bêhempa diyarî gelê Kurd kir, perwerde û têkoşîna wê hişt ku têkoşîna jinan zindî bibe û Kurd ji xewa mirinê şiyar bibin. Herwiha riya azadiyê nîşanî jinan da.**R-2**

Di konferansa Parlamenta Ewropayê de biryara têkoşîna kolektîf a li dijî tecrîdê

Di konferansa li Parlamenta Ewropayê de ya li ser rewşa girtiyên siyasî ku têne tecrîdkirin û êşkence li wan tê kirin, işaret bi pêwîstiya têkoşîna hiqûqî û siyasî ya li dijî tecrîdê hate kirin.**R-3**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1160 14-Nîsan-2024 www.ronahi.net/ku/

YEKRÊZIYA KURDÎ MISOGERIYA SERKEFTINÊ YE

Dagirkerên axa Kurdistanê ji bo qirkirina gelê kurd bi 10’ê salane li dijî kurdan siyasetên qirkirinê didin meşand. Bi taybet Dewleta Tirk a dagirker ji destpêka avabûna xwe ve û heta niha li dijî gelê kurd komkujiyan pêk tîne û destkeftiyên kurdan li ku derê hebe, êrişî wê dike. Siyasetmedarên kurd dan zanîn ku dagirkeriya Tirk ji bo gelê kurd dijminê bingehîn e û di pêvajoya niha de yekrîziya kurdî tekeziya serkeftina doza gelê kurd e.**R-4**

‘Armanca vekirina klînîkên dil û çav xizmeta gel e’

Di 4`ê Nîsanê de Nexweşxaneya Dil û Çav bi alîkariya Desteya Tenduristiyê Klînîkên dil û çav ji bona xizmeta gel vekirin. Rêveberê Nexweşxaneya Dil û Çav Mûaz Abdelkerîm diyar kir ku armanca vekirina klînîkên dil û çav xizmeta gel e.**R-6**

Xelîl Dag bingeha sînemaya jinê li Rojava ava kir

Endama Komîna Fîlm a Rojava Nadiya Derwîş diyar kir ku bi saya keda şehîd Xelîl Dag jin îro dikare cihê xwe di qada sînemayê de bigre û bi rola pêşengtiyê rabe û got, “Têkoşer Xalîl Dag ji jinê re bû ronahiya serkeftin û xwebaweriyê.”**R-7**

‘Ji bo demokrasî û azadiyê lidarxistina hilbijartinan gavekî girîng e’

Hevseroka Komîseriya Bilind a Hilbijartinan a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rûken Mele Ibrahîm diyar kir ku pêkanîna hilbijartinên demokratîk ji bo tevahiya pêhateyên herêmê qonaxeke dîrokî ye û got, “Em bang li hemû gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dikin ku beşdarî xebatên hilbijartinê bibin .”**R-5**

Têkoşîna jinan a ji bo mafê dengdanê
Zozan Cizîrî R-2

Dayika Uweyş îlhama têkoşîna azadiya jinên Kurd bû

Dayika Uweyş dibistana destpêkê ya Rêber Apo bû, wê berhemekî bêhempa diyarî gelê Kurd kir, perwerde û têkoşîna wê hişt ku têkoşîna jinan zindî bibe û Kurd ji xewa mirinê şiyar bibin. Herwiha riya azadiyê nîşanî jinan da.

Lîloz Hisên/Qamişlo

Uweyş Ocalan ku bi kesayeta xwe ya serhildêr tê naskirin, nimûneya jin û dayika rasteqîn bû, cewherê jinan a rasteqîn temsîl kir, dayika ku pernesîb, nirx û fikrên azadiyê dijî zilm û zordariyê çand.

Bandora Uweyş Ocalan li ser kesayeta jinan

Uweyş Ocalan bi salane têkoşîn kir û bandoreke wê ya erênî li ser guhertina kesayeta jina azad hebû, kesayeteke xurt bû di civaka xwe de, tevî adatan û cûreyên jiyanê yên zehmet di wê demê de karîbû kesayeta Rêber Abdullah Ocalan ava bike. Jinan gelek şêwazên berxwedan û çawaniya mezinkirina zarokan li ser riya rast ji Uweyş Ocalan girtin, roleke wê ya çalak û erênî li ser tevahî jinan hebû, ku çawa jin bi cidî layiqê wateya peyva dayikbûnê bin, rêberekî mezin biafrîne dilsoz be ji hewildanên dayik û jinan re, bi felsefeya jina azad bi milyonan jinan gihaştin riya azadî û rûmetê. Her jineke ku felsfe û fikrê Rêber Abdullah Ocalan naskir di nava kesayeta xwe de dayik Uweyş hebû, zarokên xwe fêrî hezkirina welat û fedakirinê ji bo azadiyê kir.

Jiyana dayika Uweyş

Dayika Uweyş di 26'ê Mijdara 1918'an de li gundê Amara yê navçeya Xelfetî ya Rihayê ji dayik bû. Ew zaroka bavekî kurd û dayikeke tirkmen bû. Di temenekî biçûk de bi kesekî ji gundekî cîranê tirkmenan re hat zewicandin. Di sala ewil a zewaca xwe de zilamê ku pê re zewicî hewl dide jinekê birevîne û jina ku naxwaze bireve tê qetilkirin. Uweyş Ocalan ku şahidê bûyerê bû, yekem serhildana xwe ya li dijî feodalîzmê bi şahidiya mêrê ku pê re zewicî kir. Piştî vê yekê ew vegeriya cem malbata xwe û dûvre bi Omer Ocalan re zewicî û ji vê zewacê 3 keç û 4 xortên wê çêbûn. Lê belê zarokek wê yê dawî Alî di 12 saliya xwe de ji ber tumora mêjî wefat bû.

Dayika Uweyş ji bilî mezinkirina zarokên wê timî karê zeviyê dikir û karê malê dikir. Herwiha ew gelek mêvanperwer bû, keça wê Fatmaiyê li ser dayika xwe wiha digot: "Dema mêvan bihata mala me dayika min pir kêfxweş dibû. Em dema ji nav zeviyê dihatin dayika min ji me re girar û dew çêdikir. Me hemûyan pir ji vê xwarinê hez dikir. Dayika min gelek dihat hezkirin. Her tim xwedî vê baweriyê bû ku digot wê rojekê Gelê Kurd bi ser keve. Her tim digot 'em ê rojekê biserkevin. Dayika min Uweyş jinek bi qîmet û rumet bû."

Dayika Uweyş zarokê xwe fêrî berxwedanê dikir

Ûveyş Ocalan zarokên xwe ji zaroktiyê wan fêrî şer dikir. Dixwest zarokên wê li ber xwe bidin wê hîn dikir ku bi berxwedanê serketin dikare were bidestxistin. Rêber Abdullah Ocalan der barê dayika xwe wiha dibêje: Diya min ev hîs da min: Tu nikarî bi penahiyê li min bijî, her tim ji min piştgirî û alîkariyê bistînî, bi girî û nalîn û bi taybetî jî bi vî rengî tevbigerî, teqez dê bersiva te hebe. Diya min bû tofaneke serhildanê. Dê serî li ber kesî netewand. "Mêr be yan jin bûya ferq nedikir, ew ê li ser wan bimeşe û hesabê wan bixwaze."

Nirxandinên Rêber Abdullah Ocalan der barê dayika wî

Li gorî nirxandinên Rêber Abdullah Ocalan diyar bû ku dayika wî miroveke bi nav û deng bû di nava civakê de herwiha kesayetek pir xurt û xwebawer bû Rêber Abdullah Ocalan di nirxandinên xwe de wiha dibêje: "Li gund ji diya min bi nav û dengtir kesek tune bû. Ew lehiya serhildanê bû. Di qîrîn û sondxwarinê de baş bû; Ew ê bê tirs êrîşî her kesî, mêr an jin, û hêrs bike. Bi gotineke din, ew kesayetiyek bûyeran bû. Di derbarê parastinê de jî tiştek heye ku ez parve bikim. Wekî din, em dikaribûn bibin kesek pir nezelal. Her weha mimkûn bû ku ez bi gotina wan zarokek pir gemar û bindest bûma. Di vê wateyê de divê qîmeta wê were nirxandin."

Çend nirxandinên Rêber Abdullah Ocalan ên der barê dayika wî Ûveyş Ocalan de wiha ne: "Rewşa min a nakok a di vê pozîsyona malbatê de û derketina nakokiyê ji zû de, bandoreke diyarker li geşedanên piştre kir. Divê ez jî bînim bîra we ku ez jî dikarim bibûma zarokek bindest. Diya min ji bo ku ez li gorî nakokiyên xwe bibim şervan, pir bi bandor bû. Bi rastî ez dikarim bibêjim ku min perwerdeya herî mezin ji wir girt. Ji ber vê yekê, min ev yek di helwesta diya xwe de dît; Ger hûn bi dijminên xwe re mijûl nebin, hûnê qet nan nexwin û bijîn. Divê ev taybetmendiyek perwerdehiyê ya girîng be. Ji ber ku diya min li hember wan kesên ku dijmin dihesiband şervanek bû. Mînak ger zarokek li min bixista, dema ez bê tola xwe vegerim min derdixist û digot, "Teqez tu ê li ber xwe bidî."

Nivîskar û Rojnamegerê Kurd Mûsa Anter di pirtûka xwe ya bi navê "Bîranînên Min" de diyar dike ku Ûveyş Ocalan di sala 1991'an de li Enqereyê beşdarî kongreya Partiya Kedê ya Gelan (HEP) bû û bi van gotinan vê atmosferê parve dike: "Daxuyanî hat dayîn. bi mêvanên rûmetê re. Ji bo min dihat gotin ku kalikê me Mûsa Anter û diya me Ûveyş Ocalan jî di nav me de ne. Hemû dojeh şikest. Bi hezaran kes ketin rêzê da ku destên me maç bikin. Çend henekên xweş jî hebûn... Bi rastî ev kongre yek ji rûpelên herî rengîn ên jiyana min bû."

Wefta dayika Uweyş

Dema ku dayika Uweyş hewl dida vîna azadî û berxwedanê ya ku kurê wê Abdullah Ocalan di nava hemû gelan de afirandiye veguhezîne jiyana xwe, bi nexweşiya şekir ket li Edeneyê tedawî didît lê dawiyê lingekî wê tê jêkirin. Piştî tedawiya salek a li wê derê di 11'ê Nîsana 1993'an de ji ber krîza dil wefat dike. Cenazeyê wê li gundê Amarayê yê gelek jê hez dikir tê definkirin.

Ramangeh

Têkoşîna jinan a ji bo mafê dengdanê

Zozan Cizîrî

Di cîhanê de jinan ku mafê dengdanê di zeman û mekanên cuda cuda de bidest xistin, bi hêsanî çênebû. Bi pêşketina gavên şoreşî yên sedsala 20.min re hem di nav tevgera jinên burjûva de, hem jî di nav tevgera jinên kedkar de mijara keda jinê girîngiyek qezenç kir, lewre di nav tevgerên karkeran de jî ev bû mijareke nîqaşê. Ya rastî heya wê çaxê ne di nav yasayan de, ne di qada raya gişti de, ne jî di nav avahiyên siyasî û civakî de destûr nedidan jin xwe birêxistin bikin. Keda jinan dihat firotin û jin rastî kedxwariyek mezin dihatin. Lewre jin neçar man dest bi têkoşîna mafên xwe bikin. Heya wê çaxê destûr nedidan ku jin bibin endamên sendîka, komale û partiyan. Li hember vê nêzîkatiya zilamperest jinan jî dest bi sazkirina komale, dezgeh û sendikayên xwe yên piştgiriyê kirin.

Di nîva duyemîn a sedsala 19. de tevgera karkeran a pêş ketî, hişt ku jin di nav wê de xwe birêxistin bikin. Ev gavên hatin avêtin jî, di pêşengiya jinên di nav wê tevgerê de çêbûn. Komunîsta Alman Clara Zetkîn Tirmeha 1889'ê di Kongreya Karkerên Navneteweyî de -li Parîsê hat lidarxistin- axaftinekê dike û dixwaze jinên karker jî di nav tevgera karkeran de bibandor xwe birêxistin bikin. Heya wê çaxê tevgera karkeran fêrî vê tiştê nebibûn, lewre ev axaftina Zetkîn deng vedide. Zetkîn di axaftina xwe de behsa birêxistinbûna jinan, di sendîkayan de perwerdeya cinsiyetperest, modelên kevneşop, zorî û zehmetiyên jin ji ber çewisandinê dibînin dike. Her wisa ji bo xebata polîtîk a di nav jinan de şêwazên taybet pêşniyar dike. Ev helwesta Zetkîn şiyarbûnekê di nav jinên karker de pêş dixe. Têkildarî vê pirsgirêkê hinek pêşketinên girîng jî sala 1900'ê şûn de çêbûn ku partiyên sosyal demokrat ên hinek welatan di nav xwe de konferansên jinan lidar xistin. Bi taybetî 1. Konferansa Jinên Sosyalist a Navnetewî ku meha Tebaxê ya 1907'ê, bi tevlîbûna 58 delegeyên ji 15 welatan hat lidarxistin, hinek biryarên girîng ên têkildarî xwe birêxistinkirin û mafên jinan girtin. Biryareke girîng a vê konferansê jî, ji bo jinan mafê dengdana gişti û bêsînor dihat xwestin.

Hem ji bo tevgera jinên kedkar, hem jî ji bo jinên burjûva mafê dengdanê pirsgirêkek navendî û cidî bû. Vê mijarê ku mirov dikare berfirehtir rave bike, bi kurtasî heya jinan di hilbijartinan de mafê dengdanê û berbijêriyê qezenç kirin, bi salan têkoşîn kirin.

Vêca ên dema behsa mafê dengdana jinan dikin, hinek dewlet ji bo xwe pêşketî nîşan bidin dest bi zirtan dikin û bi pozbilindî behsê dikin ka çawa mafê jinan beriya her kesî dane jinan. Encex tu jineke xwedî zanistî û lêgerîna azadiya jinê bi van propagandayan naxape. Roja 31'ê Adarê jinên Kurd ên li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê elbet bi zanistî dengê xwe bikar anîn û serkeftinek mezin hem bi navê giştî jinan, hem jî di aliyê civakê de bidest xistin. Li Başûrê Kurdistanê jî di hilbijartinan de sekneke jinên Kurd a berçav heye. Di vê wateyê de eşkere ye ku jinên Kurd hem di warê nasnameya jin de, hem jî di warê siyaseta demokratîk de asteke girîng qezenç kirine. Li herêmên me yên Bakur-Rojhilatê Sûriyê jî ku di demek nêz de wê hilbijartinên saredariyan çêbibin. Wekî vê pêwistî heye yin di her hilbijartinekê de berî her tiştî bi hesta xwedî derketina li nasname û nirxên xwe yên dirokî-civakî û qezencên bi keda hezaran jinan hatine bidestxistin dengê xwe rast bikar bînin, mafê xwe yê dengdanê bi vê zanistê bikar bînin û dengê xwe destpêkê bidin jinan.

Xelîl Dag bingeha sînemaya jinê ava kir

Derhênera di Komîna Filmaan a Rojava de Nadiya Derwîş diyar kir ku bi saya keda Xelîl Dag jin îro dikare cihê xwe di sînemayê de ji aliyê lîstikvaniyê ve bigire û gelek sînariyoyan jî binvîse. Di heman demê de Xalîl Dag ji jinê re bû ronahiya serkeftinê û xwebaweriyê.

Ayşa Silêman/ Qamişlo

Jinê kariye gelek serkeftinên mezin bi dest bixe di milê sînemayê de û gavên mezin avêtiye. Berhemên ku jinê heya roja îro afirandine; Belgefilma Jinwar, Belgefilma Nûjiyan, Filmê Berbû, Filmê Kobanê, Filmê Rûpelên Sor, Belgefilmê Nameyên Ji Şengal û Belgefilmên Jiyana Me Herdem Şer Bû. Jin heya niha li ser şopa Xelîl Dag karê wê di milê sînema de berdewam e.

Di derbarê rola jinê di sînemayê de û bandora Ş. Xelîl Dag li kesayeta wê derhênera di Komîna Filman a Rojava de Nadiya Derwîş ji Rojnameya me re axivî.

Kar û xebatên jinê di aliyê sînemayê de

Nadiya Derwîş diyar kir ku jinê di hemû filman de hewilda ku karekterên jin bidin pêş û wiha got:" Jin wek karektera pasîf dane xuyanîkirin û mêr jî wek karekterekî ektîf dan pêş. Rola jinê jî heretim di van aliyan de di sînemayê de dan xuyanîkirin. Herdem di milê sînemayê de navên mêran dihatin

bikar anîn, lê îro roj jinê karîbû xwe isbat bike û cihê xwe di vî warî de bigre. Ne tenê wek lîstikvanekî di hemû filim û rîklaman de bilîze, ku wek hertim wêneyê jineke bermalî derkeve. Berûvajî vê yekê di sînemayê de bêtir hêz, zanebûn, nêrîna wê di aliyê xweşikbûnê de û fikrê wê di sînemayê de derket pêş. Ev yek di sînemaya cîhanê de jî çêbû û helbet heger em behsa Rojava bikin û sînemaya şoreşgerî ya kurd bikin, ev yek li vir jî derket pêş. Îro roj jin bixwe derhênertiyê dikin û sînariyoyan dinivîsînin, amûrên tekînkî û kamîrê jî bikar tînin û karê montajê jî dikin. Deng digrin, ronahiyê çêdikin û dîkor birêvedibin, jin roleke girîng di milê sînemayê de dilîze. Her wiha desthilatdaran gelek hewildanên xwe kirin ku vê rolê bidin windakirin û nehêlin hêza jinê derkeve pêş, lê belê jinê ev yek qebûl nekir û guhertinên gelek mezin çêkirin di milê sînemayê de.

Pêşketina jinê di hemû qadên jiyanê de

Nadiya Derwîş berdewamî da axaftinên xwe û wiha got:" Jin di hemû aliyên jiyanê de kariye xwe bide isbat kirin, îro jin dikarin hemû karan bikin, hêz, fikir û nêrînên wê jî hene. Di hemû qadan de jinê kar û xebat dan meşandin, yek ji wan huner û sînemaye ku îro jin bixwe çîrokên xwe dinivîsînin û derhênertiyê jî dikin. Her wiha pêşketinên gelek mezin kirine û di hemû beşên girêdayî sînema û teknîkê de jî gavên mezin avêtiye. Xelîl Dag yê ku bingeha sînema çiya avakiriye û di sînema çiya de pêşengtî jî kiriye, di hemû filmên xwe de roleke girîng daye jinê û cihê jinê derxistiye pêş. Xelîl Dag di filmê Bêrîtan de şorşgerî û pêşengiya jin derxist pêş û ev yek li hemû cîhanê belav kir. Ji bo jinê hin axaftinên wî jî hebûn, ji ber ku heta dawiyê baweriya wî

bi jinê dihat. Di cîhanê de jin rastî gelek astengiyan hatiye û gelek berxwedanî kirine heta ku gihan astekî ku xwe nasbikin, nasname û hebûna xwe jî naskirin. Her wiha li Rojavayê Kurdistanê karê ku jin tevlî nebe ew kar ne temame, ji ber vê yekê Şoreşa Rojava bi Şoreşa jin tê nasîn. Bi vî fikirî û nêzîkatiyê cihê jinê yê bingehîn di aliyê sînemayê de hebû."

Xelîl Dag ji bo jinê çavkaniya hêzê bû

Derhênera di Komîna Filman a Rojava de Nadiya Derwîş dawî li axaftinên xwe anî û wiha got: "Jin hêza xwe ji Xelîl Dag digre ji ber ku rol û pêşengiya jinê derixist pêş, bi riya vê yekê me karîbû ku em fikir û feraseta xwe ji riya Xelîl Dag dest pê bikin û hîn jî berdewam dikin. Niha di hemû xebatên çêkirina filman de jî jin cihê xwe digire, di hemû beşan de xwe pêşdixin û gihandiye astekî ku bi pisporî jî kar dikin. Her wiha hin derhênerên jin hene ku ew bixwe film û sînaryoyên xwe dinivîsin, heya niha jî gelek berhemên ku jinê bi xwe jî çêkirina derketine pêş."

Ji Cerablûsa dagirkirî ber bi Kobanê lîstikvaneke ciwan

Jina ciwan Mûna El-Cadir ku bi eslê xwe ji bajarê Cerbalûsê ye, hewl dide bi şano û lîstikvaniya xwe bibe deng û rengê şoreşa jinan.

Aloziya Sûriyeyê ku ji 2011'an de bi hemû rengên xwe berdewam dike, xeyal û pêşeroja gelek nifşan bi xwe re tarî kir. Zarokên ku beriya aloziyê bi dehan xewin û armancên xwe dihûnandin, bi şer û pevçûnan mezin bûn û neçarî guhertina planên xwe man.

Şoreşa Rojavayê Kurdistanê ku li hemberî aloziya li Sûriyeyê weke çareseriyeke alternatîf xwe da der, bala bi hezaran malbatên ji pêkhateyên cuda yên Sûriyeyê kişand ku niha li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dijîn. Jina ciwan Mûna El-Cadir a 19 salî, li gel malbata xwe di encama êrîş û dagirkeriya Ceralbûs ji aliyê çeteyên dewleta Tirk ve, di 2014'an de koçberî Kobanê dibe. Xeyalên wê jiyana bi ewle û aram bû, li Kobanê armanca xwe nas kir û bi keskesên mezin bû lîstikvaneke ku bi sedan şopîner û hezkiriyên wê çêbûn. Mûna El-Cadir ku niha gelek xebatan bi hev re dimeşîne behsa serpêhatiya jiyana xwe dike.

Koçberî li pêşiya xeyalên wê bû asteng

Mûna El-Cadir a 19 salî wiha behsa xwe dike: "Em di sala 2014'an de hatin Kobanê, ez wê demê 7 salî bûm. Wê demê me kesekî çanda Kobanê nas nedikir, ji ber vê jiyana min bi xwendinê re sînordar ma. Di sala 2014'an de DAIŞ'ê êrîşî Kobanê kir û em cara duyemîn neçar man koçber bibin û derbasî Bakurê Kurdistanê bûn. Ji ber vê me gelek astengî dît, di salekê de em 2 caran koçber bûn. Piştî rizgarkirina Kobanê, em jî vegeriyan û êdî me rewşa xwe komî li ser hev kir û li Kobanê bi cih bûn. Min heta refa 9'an xwend, piştre di 2021'an de min serdana navenda Çand û Hunera Baqî Xido kir û min çend kes nas kirin. Hezkirina min ji şanogeriyê re hebû lê min tiştek nizanibû. Piştî wê min perwerdeya xwe dît û bi parvekirina dîmenan re hatim naskirin û şopînerên min jî çêbûn. Di destpêkê de gelek bertekên neyînî hebûn, lê piştre ev yek derbas bû û hezkiriyên min çêbûn."

Ast û armanca xwe li Kobanê nas kir

Mûna El-Cadir wiha behsa lîstikvaniya xwe kir: "Dema ez li Cerablûsê biçûk bûm lê di zanebûna hemû mijaran de bûm. Ji ber vê xeyalên min ên zaroktiyê rawestîna şer û jiyana bi aramî bû. Bi hatina min a Kobanê re, gelek armancên min çêbûn ku yek ji wan ew bû ez bikaribim bi zimanê nîştecihên herêmê biaxivim û fêr bibim. Ji ber vê min bi şev û roj xwe fêrî zaravayê kurmancî kir ku ez niha baş dizanim. Bûyerên ku min jiyan kirin bandoreke mezin li ser min kirin, lewre weke xeyal min di mêjiyê xwe de xêz kir ku divê ez bibim parêzer. Rojek ji rojan xwişka min a biçûk ji min re got ka em bibim şanoger ango lîstikvan da ku her kes me nas bike. Min destpêkê mijar nepejirand ji ber ku li herêma me, derfet tunebûn lê bi serdana navenda Çand û Hunerê re, hizrên min hatin guhertin û min biryar girt ku ez bibim lîstikvan. Li gel berhemên xwe yên kesayetî, ez amedekariyên beşdarbûna mihrîcana Mîtan a Şanoyê dikim her wiha ez cihê xwe di belgefîlim û rêzefîlimeke Erebî de ku dê li bajarê Minbicê were kişandin digrim."

Bû yekemîn lîstikvana jin li ser medyaya dîjîtal a Kobanê

Mûna têkoşîna ku ji bo bibe lîstikvan daye wiha anî ziman: "Me heta niha tu xebatên profesyonel ango di çarçoveya sînemageriyê de nekiriye, tenê em hinek şanoyên li ser pirsgirêk û nakokiyên di nava civakê de çêdikin û li ser qenala xwe ya Youtube belav dikin. Bêguman ez bi van xebatan re sînordar namînim, hewldanên min hene ku ez xwe di beşa sînemayê de bi pêş bixim û berheman biafirînim. Weke jineke ciwan di medyaya dîjîtal de tecrûbeyeke nû ye li Kobanê heta niha nekêşên weke min tune ne. Ji ber vê min gelek astengî dîtin ku di çanda Kobanê de ev mijar nayê pejirandin lê min li hemberî hemû astengiyan şer kir û gihîştim vê astê."

Şoreşa jinan yek ji armancên wê yên belgefîlman e

Lîstikvan Mûna El-Cadir da zanîn ku ji armancên wê çêkirina belgefîlmek li ser şoreşa jinan e û got: "Armancên min gelek in ji bo pêşerojê, bi taybetî ez dixwazim belgefîlmek ji nivîsandin û derhêneriya min be çêkim. Her wiha ez di pêşerojê de di nava berhemên xwe de bi taybetî balê bikşînim ser şoreş û têkoşîna jinan. Çawa ku hemû jin di nava vê şoreşê de xwedî têkoşîneke cuda ne, ez ê jî bi riya huner û şanogeriyê rola xwe bilîzim da ku bikaribim hişmendiya paşverû ya li ser jinan bişkînim. Min bi gelek dîmenên xwe bal kişandiye ser rastiya ku jin di nava malbat û civakê de dijîn. Ji bo jinan cihekî cuda nehatiye veqetandin, berovajî jin di malê de bi zordarî, bê nirx û lawaz tên girtin. Ez jî dixwazim bi lîstikvaniya xwe diyar bikim ku jin xwedî hebûn, vîn, hest û hizr in, jin dikarin hemû xebatan bimeşînin û weke ferdeke çalak di nava civakê de cih bigre."

‘Armanca vekirina klînîkên dil û çav xizmeta gel e’

Di 4`ê Nîsanê de Nexweşxaneya Dil û Çav bi alîkariya Desteya Tenduristiyê Klînîkên dil û çav ji bona xizmeta gel vekirin. Rêveberê Nexweşxaneya Dil û Çav Mûaz Abdelkerîm diyar kir ku armanca vekirina klînîkên dil û çav xizmeta gel e.

Ronaz Silêman/Qamişlo

Desteya Tenduristiyê ya herêma Cizîrê, ji bo ku xebata tenduristiyê pêşkêşî şêniyên herêmê bike, 21`ê Çile li taxa Enteriyê ya bajarê Qamişlo Nexweşxaneya Dil û Çav ava kir. Avayiya nexweşxaneyê ji 3 qatan pêk tê. Ya yekemîn a rêveberiya nexweşxaneyê, pêşwazî, arşîv, dîwan, hesabdarî, taqîgeh, dermanxane, odeya teweriya çînî (tebeq mihwerî) û beşa destwerdana lezgîn. Qata duyemîn a tedawiya nexweşiyên dil e. Ya sêyemîn jî ya tedawiya nexweşiyên çav e. Nexweşxane bi amûrên nû hatiye amadekirin. Nexweş li beramberî mizaxtinên sembolîk tên dermankirin. Ev mizaxtin ji nexweşxaneyên din kêmtire. Armanca vekirina vê nexweşxaneyê ew bû ku nexweşên dil û çav yên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ji bo tedawiyê êdî neçarî çûna derve nebin.

Mûaz Abdelkerîm

Henan Mihemed

Klînîkên dil û çav heyanî 1.30 nîvro nexweşan pêşwazî dike

Ji xwe ji dema vekirina Nexweşxaneya Dil û Çav de, pêwîstiya nexweşxaneyê bi klînîkan hebû, da ku astengî bi nexweşan re dernekevin, lê derfet di wê demê de tune bû, lewra di 4`ê nîsanê roj rojbûna Rêber Abdullah Ocalan de, Klînîkên dil û çav di nexweşxaneya dil û çav de hat vekirin. Klînîk beşek ji Nexweşxaneya Dil û Çavan in (ku ew jî di cûreyê alîkariyê de nexweşxaneya tekane ya li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye. Ji alîkariyên ku klînîk pêşkêş dikin taqîkirina dil û çavan bi amûrên bijîşkî yên nûjen e. Deriyê Klînîkên Dil û Çav ji seat 8.30 heyanî 1.30 nîvro ji bo pêşwazîkirina nexweşan vekiriye, 7 bijîşkên pispor bi dil û çav di 24 seatan de dorbidorin, ev bijîşk di klînîkan de kar dikin heyanî 1.30 piştre jî derbasî beşê emeliyatan dibin û roja şemiyê beltalenye.

Derbarê vekirina Klînîkên Dil û Çav de Rêveberê Nexweşxaneya Dil û Çav Mûaz Abdelkerîm û yek ji dayikên nexweşa dil a bi navê Henan Tawiz ji rojnameya me re axivîn.

Mûaz Abdelkerîm diyar kir ku berî vekirina klînîkên dil û çav Kêmasî di istiratîcîya kar û xebatên nexweşxaneya dil û çav de hebû û wiha got: “Dema ku nexweşxane bê klînîk kar û xebat dikir, ji aliyê nexweşan ve hin zehmetî dihatin kişandin. Ji ber ku nexweşên dihatin şopandina karên wan ê tenduristî û hin pilansazî dihatin kirin, mîna îko, pîlankirinî ji aliyê bijîşkên pispor ve û ev nexweş vedigeriyan klînîkên taybet, di vir de nexweşan astengî didîtin, lewra ji bo ku pirogiramê nexweşxaneya dil û çav bi hemû awayî bê temamkirin, kar û xebat ji bona derbaskirina van astengiyan hat kirin.”

‘Klînîkên dil û çav bi şev û roj xizmeta gel dikin’

Mûaz Abdelkerîm eşkere kir ku cara yekê klînîkên bi vî rengî di nexweşxaneyan de tên vekirin û wiha got: “Li ser asta Sûriyê giştî klînîkên bi vî rengî ku di nexweşaneyan de têne avakirin tune bûn, ev cara yekê ye ku ev yek di nexweşaneya dil û çav de pêk hat. Her wiha ji bo vekirina van klînîkan, ji aliyê Nexweşxaneya Dil û Çav bi alîkariya Desteya Tenduristiyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve kar û xebat hatibû kirin, hazirkirina wê ji aliyê Desteya Tenduristiyê ve hate kirin û avakirina wê jî bi pereyên ji sindoqa Nexweşxaneyê bû. Di asta klînîkên çav de jî beşê berçavkan û çavan hatin vekirin, her wiha klînîkên dil û çav di eyînî korîdorê de ye. Ji xwe klînîkên dil û çav di roja 4`ê Nîsanê roja rojbûna Rêber Apo de weke diyarî ji bo gel hat vekirin.”

‘Em’ê 24 seatan di xizmeta gel de bin’

Rêveberê Nexweşxaneya Dil û Çav Mûaz Abdelkerîm axaftina xwe wiha qedand: “Berî niha hewldanên me hebûn ku em van klînîkan vekin lê derfetên me tunebûn, lê di sala 2024`an de Nexweşxaneya Dil û Çav bi xwe giha wan derfertan ku klînîkan veke, ji xwe bi buhayeke gelekî kêm nexweş tên tedawîkirin, tenê weke alîkarî ji nexweşxaneyê re ye, ji ber nexweşxane bi xwe, xwe birêve dibe, carnan pêwîstî hebe Desteya Tenduristiyê dibe alîkar pêre, li gorî vê sîstemê klînîk jî jêre dibin piştgirî. Ji xwe di herdû klînîkan de amûrên herî pêşketî tên bikaranîn. Soza me xwedîderketina vê nexweşxaneyê ye, ji ber ev nexweşxane nirxekî bi keda şehîdan hatiye avakirin, li ser vê bingehê em ê 24 seatan di xizmeta gel de bin.”

‘Bi vekirina klînîkan nema zehmetiyan dibînin’

Di heman çarçoveyê de yek ji dayikên nexweşa dil a bi navê Henan Mihemed Tawiz ku ji bajarê Amûdê ye kêfxweşiya xwe ji vekirina van klînîkan re wiha anî ziman: “Bi vekirina van klînîkan barê me sivk bûye, berê em diçûn klînîkên taybet û yên taybet jî bûhabûn, lê niha em bi vekirina klînîkan nema zehmetiyan dibînin.”

Li bajarê Hesekê firoşgehên cilên Balê pir dibin

Birûc Resûl/Qamişlo

Firoşgehên cilên kevin yê ku bi navê Balê tên naskirin roj bi roj pir dibin, li hemû deveran tên vekirin, bi taybet li taxan ji ber têkçûna rewşa aborî ya xelkên bajêr. Sedema ku dihêle ev firoşgeh kar bikin û bala welatiyan bikşîne, ji ber ku bihayê cilên ku li van firoşgehan li gorî deverên din erzane.

Firoşgeha cil û berg, pêlav û çenteyên ku ji derve tên girtin ku destpêkirina wê ji malan bi rêjeyeke şerim dihat dîtin. Di dawiya sala 2013’an de li firoşgeha Hesekê belav bû û heta sala 2014’an li ser rawestgeh û dikanan bi awayekî giştî jî bo firotinê xuya bû. Êdî gel xwe li cilên kevin digirin da ku bi navê (Balê) tê naskirin. Ji ber ku nirxên wan erzane li gorî rewşa madî ya nebaş ya ku Sûriye tê re derbas dibe.

Bazirganiya cilên kevin li bajarê Hesekê ji bo her kesê riya debarê ye. Ji bo jin û her wiha zilaman riya kar û bar e. Ji bo kesên ku li cilên erzan digerin, kirîna cilên xebitandî riyeke baş e. Ev bazirganî, heta niha ji bo mêran tenê bû, lê di van salên dawî de nîvê bazirganên jinên ku li hemberî xizanî û tunebûnê têdikoşin in.

Di derbarê firoşgeha cilên kevin (Balê) û sedema komkirin û kirîna gel ji wan re xwediyên dikanên balê Xalid Qasim û welatiyê bi navê Sumeye Alî ji Rojnemeya me re axivîn.

Xalid Qasim wiha di destpêka axaftina xwe de got: “Karê me di vî warî de baş e, her dikanek mişteriyên xwe hene, ku piştî anîna kelûpelan, em wan bi awayekî pak rast dikin û carinan em mişteriyên xwe agahdar dikin ku cilên bala wê di kîjan demê de were vekirin. Herwiha piraniya mişteriyên me ji gundên nêzîk û hin taxên dûrî bajêr in. Em cilên xwe ji welatên Ewropayê, Kenda yan jî Lubnanê tînin, her yek bi buhayekî cuda û li gorî qelîteya cilan ji hev cuda dibe. Piraniya cilên balê di deriyê Cerablusê an jî di deriyê Sêmalkan re derbasî Bakur û Rojhilatê Sûriyê dibe.

Firotina cilên Balê

Xalid Qasim diyar kir ku: “Kelûpelên ku bi rojan di dikanê de dimînin bêyî ku werin firotin, em didin mişteriyên xwe yên ku firoşkarên kolanan in û ew jî li bazarên gerok an jî li gundan belav dikin û ew jî van kelûpelan bi buhayekî erzantir difiroşin da ku karibin sûdê ji wan werbigrin. Tevî ku cilên Balê bi bihayekî erzan têne firotin û mişterî jî digrin, lê li milekî din jî ger ku ev cil bi rengekî paqij neyên girtin, wê bi xwere gelek nexweşiyan çêbike.

‘Ji ber kêm derfetên madî, welatî berê xwe didin cihên Balê’

Di heman çarçoveyê de welatiyê bi navê Sumeya Alî diyar kir ku bi bilnd bûne nirxên dolar û bihabûne cilên nû, welatî berê xwe didin kirîna cilên kevin. “Ji ber ku cilên balê nirxên wan kêmtire û rewşa me ya madî pir lawaze û 5 zarokên min jî hene, herwiha 3`ê ji zarokên min diçin dibistanê û pêwîste ku em cilan ji wan re peydabikin. Em bi hêvîne ku ev cilên kevin jî nirxên wan bilind nebin, pêwîste her firoşgihek bi malbatên ku nikarin debare jiyane xwe bikin bi wan re bibin alî kar.

Di konferansa Parlamenta Ewropayê de biryara têkoşîna kolektîf a li dijî tecrîdê

Di konferansa li Parlamenta Ewropayê de ya li ser rewşa girtiyên siyasî ku têne tecrîdkirin û êşkence li wan tê kirin, işaret bi pêwîstiya têkoşîna hiqûqî û siyasî ya li dijî tecrîdê hate kirin.

Navenda Nûçeyan

Konferansa bi sernavê ‘Mehkûmên siyasî: Tecrîd, kiryarên xerab û êşkence’ bi malovaniya endamê Parlamenta Ewropayê Massîmîliano Smerîglio hate lidarxistin. Ji gelek welatan beşdar tevlî bûn. Konferans ji aliyê Yekîtiya Parêzerên Ewropayê ya ji bo Mafên Mirovan a Cîhanê û Demokrasiyê (ELDH), Parêzerên Demokrat ên Ewropî (AED) û Komeleya Hiqûqê ya Navneteweyî ya Demokrasiyê (MAF-DAD) ve hate birêxistinkirin. Di encamnameya konferansê de işaret bi sîstema tecrîd û êşkenceyê hate kirin û li ser rê û rêbazên têkoşîna li dijî vê yekê hate rawestîn. Di encamnameyê de ji bo rakirina tecrîdê û bidawîkirina êşkenceyê pêwîstiya bi têkoşîna hiqûqî û siyasî ya kolektîf hate destnîşankirin.

Tecrîd veguherî rejîma înfazê

Di konferansê de ev tespît hatin kirin:

“Di serî de girtîgehên Tirkiyeyê li girtîgehên tevahiya Ewropayê bûyerên kiryarên xerab û êşkenceyê her roj hîn zêde û şênber dibin. Çavdêrî nîşan didin ku tecrîd veguheriye rejîmeke înfazê, bi biryarên sirgûnê yên kêfî malbat û xizmên girtiyan têne cezakirin. Pêkhateyên konferansê destnîşan kirin ku êşkence û kiryarên xerab ên li girtîgehan pirsgirêkeke bingehîn e ku encamên xwe yên sosyo-polîtîk ên cidî hene.

Rewşa li Herêma Baskê, Katalonya, Macaristanê, qanûna înfazê ya cihêkar û nebûna şert û mercên têrker ên hîjyenê ku bandorê li mehkûmên siyasî dikin, çend ji mijarên di rojeva konferansê de bûn. Ji ber kêmaniya demê neketibe rojevê jî tê zanî ku rewşa li Yewnanistanê bi taybetî di mijara penaberan de ji Îngilistan û Elmanyayê cuda nîne.

Li tirkiyeyê rewşeke welê heye ku ji gelek aliyan ve cihê fikaran e

Tirkiye ku yek ji wan welatan e ku hejmara girtiyên siyasî lê gelekî zêde ye, ji gelek aliyan ve xwedî rewşeke welê ye ku cihê fikaran e. Bi saya rejîma otorîter a ku AKP û hevalbendên wê ava kir, serweriya hiqûqê veguheriye amûreke zexta siyasî Kiryarên hiqûqî û îdarî yên nû yên li Tirkiyeyê li dijî girtiyên siyasî bi cih têne anîn, her roj dikevin meriyetê. Modelên nû yên girtîgehan, sirgûnkirina bi kêfî, betalkirina berdana girtiyan bi hinceta dîsîplînê, standina mafê serbestiya bi kontrol, astengkirina xizmetên tenduristiyê, qedexekirina ragihandinê çend ji van e. Lêgerîna bi rengê tazîkirinê û serjimartina ku li girtîgehan bi rêk û pêk têne kirin, êşkence û kiryarên xerab dikin parçeyek ji jiyana rojane.

Li îmraliyê tecrîdeke welê heye ku mînaka wê nîne

Tecrîda li Girava Îmraliyê mînakeke xwe li devereke din nîne. Sê salên dawî bi ti awayî agahî ji Abdullah Ocalan nikare bê wergirtin. Ev kiryara tecrîda giran ku li nava civaka Kurd, hêzên demokrasî û hiqûqê bûye cihê fikaran e, di heman demê de asteke êrîşa îmha û înkarê ya li dijî gelê Kurd e. Tecrîd û şerê ku li dijî gelê Kurd tê meşandin nîşaneya aliyên cuda yên heman nêzîkatiya siyasî ye. Têkoşîna li dijî tecrîdê ku ji bo bilindkirina rûmeta mirovahiyê divê bi rêk û pêk bê meşandin, bi taybetî yek ji dînamîkên herî girîng ên têkoşîna demokrasî û aştiyê ya li Girtîgeha Girava Îmraliyê ye.

Bang: Li dijî tecrîdê pêwîstî bi têkoşîna siyasî û hiqûqî ya kolektîf heye

Pêkhateyên konferansê li hemberî rewşa mafên mirovan a ku li tevahiya Ewropayê nebaş dibe, bi taybetî jî li dijî sîstema tecrîd û êşkenceyê ya li girtîgehan biryar dan ku divê têkoşîneke siyasî û hiqûqî ya kolektîf bê meşandin.

Di vê çarçoveyê de beşdarên konferansê van bangan li Yekîtiya Ewropayê û Konseya Ewropayê dikin:

Ji bo dawîanîna li Girtîgeha Girava Îmraliyê ku navnîşana sereke ya êşkenceya tecrîdê û rejîma înfaza kêfî ya li hemberî girtiyên siyasî, kiryarên li derveyî mirovahiyê yên li girtîgehên Tirkiyeyê ye, helwesteke hîn çalak bê nîşandan, gavên şênber bêne avêtin.

Ji bo şopandina şert û mercên girtîgehên li Macaristanê û sererastkirina şert û mercan gavên pêwîst bêne avêtin.

Li dijî rejîma înfazê ya cihêkar û qanûnên din ên li Herêma Baskê, Tirkiye û welatên din destwerdanên şênber bêne kirin.

Divê CPT bi berpirsyariya xwe rabe

Her wiha CPT di mijara Girtîgeha Girava Îmraliyê de ji bo şopandina pirsgirêkên li girtîgehên Ewropayê kûr bûne û nirxandina wan, bi erk û berpirsyariya xwe rabe.

Nêrîn û pêşniyar

Beşdarên konferansê di encama pêşkêşî û nîqaşan de nêrîn û pêşniyarên xwe anîn ziman û biryar dan ku li van qadên hevpar têkoşînê bimeşînin:

Ji bo têkoşîna hiqûqî ya hevpar li dijî tecrîd û êşkenceyê bi rêk û pêk û bi bandor bê meşandin, destpêkê tevneke vekirî ya ji beşdarên konferansê bê avakirin.

Ji bo nîqaşkirina kiryarên xerab û êşkenceya li girtiyan, bi pêşengiya rêxistinên hiqûqê û parêzerên tevlî konferansê bûn, konferanseke du rojan a bi beşdariyeke berfireh bê lidarxistin. Konferanseke bi vî rengî dikare kiryar û mewzûatên li welatên cuda hîn bi hêsan nîqaş bike. Ji bo amadekirina vê konferansê wê koma xebatê bê avakirin.

Bi armanca piştgiriya ji bo daxwaznameya 1.330 parêzeran ku Çileya 2024’an îmze kirin, pêşkêşî Wezareta Edaletê ya Tirkiyeyê kirin û xwestin dawî li tecrîda li Girtîgeha Girava Îmraliyê bê anîn, ji aliyê parêzerên Ewropî ve bi heman armancê kampanya îmzeyan bê destpêkirin.

Parêzer û hemû nûnerên saziyên civaka sivîl ên tevlî konferansê bûn biryar dan ku bala baroyên xwe û rêxistinên hiqûq û mafên mirovan ên navneteweyî bikişînin ser pirsgirêkên li girtîgehan.”

Komkujiya Enfalê; Birîna gelê kurd a bê derman

Navenda Nûçeyan

Hîna birîna Helebçeyê nehatibû dermankriin, Enfal jî bi ser de hat û kul û êşa Kurdan zêdetir kir. Rejîma Be’s a Iraqî berî 36 salan, li sernaserî Başûrê Kurdistanê bi navê Enfalê dest bi êrişêne berfireh kiribû. Di vê êrişa hovane de 182 Hezar kurd hatin şehîdxistin. Li şûna ku hikumeta Başûrê Kurdistanê li pey sûcdarên Enfalê bikeve û wan darizîne, îro bi heman rêbazî bi destê dijminên Kurdan girtiye û hevkariyê bi wan re dike.

Rejîma Sedam a Be’sî sala 1988’an, 5 hezar kurd li Helbçe ya Başûrê Kurdistanê bi kîmyabaranê kuştin û di Enfalê de jî ev jimar kir dehqat. Êrişên Enfalê yên li Dola Cafayetî û sala 1989 li Behdînanê bi dawî dibin û weke ku li cîhanê qanûn tune ne cenazyên Kurdan bi ser hev de hatin binaxkirin.

Hikumeta Başûrê Kurdistanê jî piştî desthilata Sedam têk çû, komgorên Enfalê vekirin. Li gorî wê heta niha 63 komegor hatine vekirin.

Di 18 salên dawiyê de bêhtirî 3 hezar û 730 cenaze hatin derxistin. Serokê wê demê yê Iraqê Sedam Hisên û kurmamê wî Elî Kîmawî, bi tewanên Enfal û Helbçeyê hatin bidarvekirin. Dadgeha Bilind a Sizayan a Iraqî piştî 60 rûniştinan, Hezîrana 2007’an “Komkujiya Enfal û Kîmyabara Helebçeyê”, weke qirkirin nas kirin. Di 14’ê Nîsana 2014’an de jî ji aliyê Parlamentoya Iraqê ve Enfal weke komkujî hate naskirin. Wê demê biryara girtin û darizandina gelek kesan hat dayîn. Lê Rêveberiya Başûrê Kurdistanê û Iraqê heta niha tu kes ceza nekirine. Li şûna ku li pey sûcdaran bikeve û di vê der barê de gavan biavêje tawanbarên Enfalê diparêze û wan di saziyên rêveberiyê de bi cih dike. Ne tenê ev, niha di êriş û qirkirina gelê Kurd de hevkariyê bi dijminan re dike û bi wan re dibe alîkar. Malbatên qurbanên Enfalê tevî derbasbûna ewqas salan, heta niha jî birînên wan derman nebûne û êşa wê demê ji bîr nekirine. Daxwaza wan ji Hikûmeta Başûrê Kurdistanê ew e dev ji hevkariya tewanbarên Enfalê berdin, sûcdaran darizînin û dosyaya Enfalê bixin mijareke xwe ya neteweyî.

Komkujiyên Enfal, Helebçe, Geliyê Zîlan, Dêrsim, Efrîn û Serê Kaniyê. Ev hemû navnîşanên bêbextî û dûrûtiya cîhanê li hemberî Kurdan eşkere dikin.

Siyasetmedarên kurd:Yekrêziya kurdî tekeziya serkeftinê ye

Dewleta Tirk a dagirker ji destpêka avabûna xwe ve û heta niha li dijî gelê kurd komkujiyan pêk tîne û destkeftiyên kurdan li ku derê hebe, êrişî wê dike. Siyastmedarên kurd dan zanîn ku dagirkeriya Tirk ji bo gelê kurd dijminê bingehîn e û di pêvajoya niha de yekrîziya kurdî pir girînge.

Hemza Sêvo/ Qamişlo

Hevrêziya kurdî bi derbirîneke kurt, ew xewn, doz û xwesteka her mirovekî kurd xwedan firkrê netewperwer e. Ji sedên salan ev vîn û daxwaz di xeyal û ramana kurdan de digere. Bi taybet ji serdema Peymana Lozanê û Saykis Pîko ve yên ku bingehê yekrêziya kurdî ruxandin, hat pêkanîn. Êdî erdîngariya Kurdistanê bû 4 perçe, her perçeyek dewletek xwedî serweriyeke cuda bi zimanekî cihêreng û xwedî siyseteke qirêj pir reng. Dewleta Tirk, Îran, Sûriyê û Îraqê bi dirêjahiya 100 salan piştî Peymana Lozanê de xwestin ku gelê kurd û hevrêziya kurdî ji hev parçe bikin.

Bi dirêjahiya 100 salan van dewletan bi siyaseta xwe karîn serweriya xwe li ser gelê kurd ferz bikin û hemû nêzîkatiyên gelê kurd qedexe bikin. Lê tevî wiha jî gelek hewildan hatin kirin ku gelê kurd bibin yek û hîna jî ev yek berdewam e.

Têkildarî yekrêziya kurdî û hevkariya PDK'ê bi dewleta Tirk û dijminê gelê kurd re, siysetmedarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji Rojnameya me re axivîn.

Silêman Ilyas

Mihemed Kûzê

'Dewleta Tirk, dijminê gelê kurd ê bingegîn e'

Siyastmedar û endamê Desteya Rêvebir ya Kongireya Neteweyî ya Kurdistanê, Silêman Ilyas da zanîn ku dewleta Tirk a dagirker ji bo gelê kurd û destkeftiyên kurdan dijminekî bingehîn e û wiha got: "Dijberiya dewleta Tirk a dagirker ji gelê kurd re mijareke kevin e. Çi di serdema osmaniyan de be û çi di dema niha, ango AKP û MHP' de be. Herwiha dewleta Tirk bi hemû awayan dijberiya gelê kurd kiriye û qeyran bi serê kurdan de pêk anîne. Lewma divê em kurd li mijara dijberiya dagirkeriya Tirk bi rengekî pragmatik binerin. Ji ber ku dewleta Tirk ji bo tevahiya gelê kurd dijminê bingehîn û navendî ye. Ev dijberî jî li ber çavan bi zelalî tê dîtin. Ji taybetmendiya wê ya xirab ew e ku destkeftiyên gelê kurd li her çar parçeyên Kurdistanê hedef digire. Çi li Bakurê Kurdistanê be, çi li Başûrê welat be û herî zêde jî bi taybet li Rojavayê Kurdistanê, Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Em dibînin ku çawa gefan dide gelê kurd û êriş dike. Êdî li hemberî van êriş û gefan em weke gelê kurd çi ji me tê xwestin? "

'Di dema heyî de yekrêziya gelê kurd tê xwestin'

Silêman Ilyas diyar kir ku tişta ku niha tê xwestin yekrêziya gelê kurd e û wiha axivî: "Di roja îro de hin partî û aliyên kurdî henin ku bi dewleta Tirk a dagirker re kar dikin. Di heman demê de destê dijminê gelê kurd girtine û rasterast xizmeta dagirkeriya Tirk dikin. Li aliyekî din jî berjewendiyên xwe yên kesayetî û malbatî li ser doza kurdî re dibînin. Ma gelo ev aliyên ku wiha dikin, nizanin ku hevkariya bi dewleta Tirk re nakeve xizmeta çarenûsa gelê kurd. Lê tişta ku em dizanin ger rêxistineke kurdî bi vî rengî kar bike û nas bike ev yek nakeve xizmeta gelê kurd û riyeke şaş e tu caran nayê qebûlkirin. Li hemberî vê tevkariya bi dagirkeriya Tirk re, tişta ku tê xwestin ew e ku em dijminê xwe baş nas bikin. Herwiha yekrêziyeke kurdî bidin avakirin da ku em destkeftiyên xwe biparêzin. Di Rojhilata Navîn de jî em weke gelê kurd roleke mezin bilîzin. "

'PDK'ê dûrî welatparêziyê ye'

Di heman çarçovey de siyasetmedar Mihemed Kûzê jî dest nîşan kir ku bi dirêjahiya dîroka kurdan PDK'ê li dijî tevgerên kurdî rabûye û ew dûrî welatparêziyê ye û wiha domand: "Ger em dîroka Kurdistanê bixwînin û lêkolîn bikin, dê gelek caran rastiya PDK û mala Barzanî bibînin. Ji beriya ku Tevgera Rizgariya Kurdistanê were avakirin jî vê malbatê li hemberî tevger û partiyên kurdî sekiniye. Di her parçeyekê Kurdistanê de dema ku kurdan dixwest ji bo xizmeta gelê kurd bike, PDK'ê dijberî wan kar kiriye. Bi taybet jî piştî damezrandina Partiya Karkerên Kurdistanê û meşa azadiya ya ber bi çiyayên azad ve. Herwiha di pêvajoya azadiya Kurdistanê ya ku PKK'ê da meşandin bi 10'ê caran PDK'ê Pêşmergeyên mala Barzanî bi dewleta Tirk a dagirker re şerê Gerîlayên azadiyê kirye. Di heman demê de PDK'ê li hemberî şoreşa Rojava jî destekê dide dewleta Tirk ji bo rewakirin êrişên dagirkeriyê. Herwiha di roja îro de PDK'ê derfet daye Pêşmergeyan ku rasterast bi dewleta Tirk a faşist re êrişî Gerîla bikin. Bi vî awayî dixwaze şerê navxweyî û birakujiyê were destpêkirin. Lewma em bang li gelê kurd, partî, siyasetmedar û rewşenbîrên kurd dikin ku li hemberî PDK'ê rabin û wê ji riya şaş vegerînin. Ji ber ku heta PDK'ê li ser vê riyê be wê tu caran yekîtiya kurdan çênebe."

Dirûtiya Faşîzma AKP-MHP'ê û Demokrasiya gelê Kurd!

Volqan Elî

Bi rastî jî di pey hilbijartinên şaredariyê yên Tirkiye û Bakur de gelek tişt hate nîqaşkirin, hate nivîsîn û dê ev hê jî bidome.

Jixwe wekî me aniye ziman, hem ji bo giştî Tirkiyeyê û hem ji bo hilbijartinên Bakur em jî dikarin çend tiştan bêjin. Fikr û şîroveyên li ser rewşê tenê hin dîtinên bi alîkariya çavdêriyan tên bidestxistinin. Ne ku dê sedî sed wisa bibe; yanî tiştekî dogma û cemid tine ye.

Piştî 31'ê Adarê li Tirkiyeyê û Bakur çi qewimîbû? Tê zanîn. Yek ji pêşketinên herî sereke û herî girîng çi bû? Faşîzma AKP'ê li ber 'leyistoka' xwe ya hilbijartinê (ev dîtina faşîzmê bi xwe ye, hilbijartin e, şaredarî ye, parlemen e û nizanim çi ye dema ku berjewendiyên wan bûn mijar, hemû hûrgulî ne) têk çû. Ev jî wan bi xwe, bi devê xwe îlan kirin. Hema hê sindoqên dengan li erdê bûn, Tayip di nîvê şevê de hem îlana têkçûna xwe kir û hem jî dubare bi devê xwe yê bi xwîn got ku em ê çawa kokê Kurdan beqelîne. Niha, ev rewşa AKP û faşîzma Erdogan ketiye nav de çavkaniya xwe ji gelek faktoran digire.

Sedema herî girîng ku faşîzma dagirkeriya Tirk di mala xwe de terpiliye (ne tenê li Wanê) û ev jî îlankiriye; têkoşîna azadiyê ya gelê Kurd e. Têkoşîn û berxwedana demokratîk a gelê Kurd, ruxmî ku hemû quweta xwe ya manewî ji wê derê girtiye em niha behsa berxwedana gerîla nakin, faşîzma bûye xewnereşka gelan di sindoqên hilbijartinê de xeniqand. Tevî hemû zilm û zordarî û dekûdolaban bi namzetên xwe yên şaredariyan bi ser ket. Ev ji bo niha bila li aliyekî bimîne.

Sedemeke duyemîn jî dibe ku ev be. Jixwe ev jî bi têkoşîna gelê Kurd re eleqadar e. Çi ye ew sedem? Wisa xuya dike ku terîqet, tekke, grubên curbicur ê Îslama siyasî ya selefî êdî wekî berê destekê bi xurtî nadin AKP'ê. Dema ku em vê dibêjin ne ku van hêzan desteka xwe bi temamî kişandine. Na! Hinek lewazbûn, ji hêzê ketin li ber çavan e. Ji bo fêmkirina vê zêde pisporiyek jî hewce nake. Mînak, di vê hilbijartinê de hin partî nû derketibûn yan jî hinan xwe neceribandibû ser ketin. YRP (partiya Refahê ya nû), BBP (partiya yekîtiya mezin) û hwd. wekî ku me gotiye ev, neyekser be jî bi têkoşîna gelê Kurd têkildar e. Li Tirkiyeyê kevneşopiyek e; hikumetên li hemberê têkoşîna azadiya gelê Kurd têk diçin ji aliyê dewleta kûr ve tên cezakirin. Pratîka dewleta Tirk tije ji van bûyerên wisa ye. Faşîzma AKP-MHP, bi taybetî jî AKP di pêvajoya desthilatdariya xwe ya 25 salan de nekaribûye têkoşîna azadiyê ya gelê Kurd tine bike. Krediya xwe, waadeya xwe xelas kiriye. Kevneşopî ev e; dema li Tirkiye partiyek dibe desthilatdar, li pişta derî û perdeyan soz dide dewleta xwe ku 'ew ê hewl bide ku tevgera azadiyê ya gelê Kurd tine bike'.

Ev derbirîn yan jî dîtinên me hin tehlîl in ne ku xwe dispêre hin belgeyên di dest de amade ne. Lê ev jî nayê maneya ku bi temamî jî bê bingeh in. (Turgut Ozal, Bulent Ecevit di berdêlê de ne tenê desthilata xwe lê canê xwe jî dan) Kesên ku piştî hilbijartinên herêmî yên li Tirkiyeyê û Bakur, rewşê dişopînin, niha jê re dibin şahid. Bi taybetî piştî ku şaredariya Wanê li gel hate vegerandin, di nava partiya Tayip, AKP'ê de di asta kadroyên wê yên avaker de, di astên din ên curbicur de nîqaşek peyda bû. Hinekan got , "ev neheqiyeke li partiya Demê hatiye kirin"û yên din dozgerê ku biryara şaredarî girtinê daye bi kêmasî dîtin, werhasilî. Gotina me çi ye? Ev hin kesên giregirên berê yan jî niha yên AKP'ê her yek xwediyê terîqat, tekke û hwd ye yan jî alîgirekî/ê wê/î ji rêzê ye. Eger ne wisa bûya faşîzma niha li Tirkiyeyê, ne ji ber mîrateyeke bi xwîn û xwîdan û keda bi dehan sal be, di asta demokrasiya burjuwa (demokrasiya herî sînordar) de jî ti car nikare destûrê bide ku pênc partî şaredariyan bigire, hemû partî wekî hev faşîst jî bin ev wisa ye (jixwe ji derveyê Partiya DEM'ê yên din dişibin hev)

Ya din jî; gelê Kurd herî dawî ji Newrozê, 8'ê Adarê bi hêza girtiye, pêvajoya hilbijartinan veguherandiye pêvajoya Şoreşa Demokratîk a Gelan û ev rewş fîilî berdewam e. Di paş gavavêtina faşîzma dagirker de roleke vê ya girîng heye: Faşîzmê mirina xwe dîtiye lewma bi kulekmayinê razî bûye!

'Yekrêziya Kurdî misogeriya serkeftina doza gelê kurd e'

Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Çep a Kurd li Sûriya Ezher Ehmed destnîşan kir ku bi qasî yekkirina helwest û yekrêziya gelê kurd wê serkeftina çareseriyên doza kurdî li Sûriyê mezin be û got, "Yekrêziya Kurdî misogeriya serkeftinê ye."

Jîn Hisên/ Qamişlo

Bi armanca xurtkirina yekrêziya kurdî fermadarê giştî yê QSD Mezlûm Ebdê însyatîfek li Rojavayê Kurdistanê dabû pêş, da ku hemû partî û rêxistinên siyasî bikevin nava yek sîwanê de û bi hewildana gihaştina nêrîneke siyasî hevbeş 25 partî û rêxistinên siyasî hatin ba hev û yekîtiya refa kurdî raghandin di bin navê Partiyên Yekîtiya Niştimanî ya Kurdî de.

Têkildarî vê mijarê endamê komîteya Navendî ya Partiya Çep a Kurd li Sûriyê Ezher Ehmed ji rojnameya me re axivî.

Ezher Ehmed di destpêka axaftinên xwe de behsa hevdîtinên ku di navbera partiyan de çêbû kir û wiha got: "Derbarê civînên berfireh ku di navbera partiyên kurdî tên li dar xistin ku bi navê Partiyên Yekîtiya Niştimanî a Kurdî tên nasîn, ev hevdîtin bi însyatîfa hin partiyên kurdî hat kirin(PYD, Partiya Çep a Kurd li Sûriya, Partiya Çep a Demokratîk a Kurdî û Partiya Aştî) bi armanca pêşkêşkirina

Destûrnameya Çareserkirina Doza Kurdî weke projeyeke kurdî ji bo yekbûna helwesta kurdî û çareserkirina aloziya Sûriyeyê. Ev hevdîtin bi amadebûna rewşenbîr, kesayetên siyasî, Partiya Yekîtî û Partiya Demokratîk a Sûrî hatin kirin. Lê ji ber neqbûlkirina hin xalên hevpeymanê ku ji 14 xalan pêk tê Partiya Yekîtî û Partiya Demokratîk a Sûrî xwe ji pejirandina hevpeymanî vekişandin."

Ezher Ehmed destnîşan kir ku ev hevpeyman destûrnameya sereke ji bo çaresekrina doza kurdî ye ku di qûnaxeke giring de derbas dibe ber bi pêşketina xebatên gihaştina lidar xistina Konferanseke ji bo yekbûna nêrînên çaresekirina doza kurdî li Sûiyeyê di heman demê de çareserkirina aloziya Sûriyeyê, ji bo bibe kaxizek ku nêrînên partiyên kurdî ji bo çareseriya doza kurdî îfade bike.

Ezher Ehmed wiha axaftinên xwe domand: "Ji ber hebûna hin sedemên cudabûnê û neqebûlkirina li ser hin xalên sereke weke(nenavendiyê, zimanê kurdî û gel ...) û hin xalên din Partiya Yekîtî û Partiya Demokratîk a Pêşverû kaxizeke din derxist ji xeynî kaxiza ku li ser hemû partiyên siyasî hat pêşkêş kirin."

Ezher Ehmed diyar kir ku: "Destûrnameya bingehîn ya ji bo çarserkirina doza kurdî li Sûriyeyê ji ENKS jî re hat şandin ji bo dayîna nêrîna xwe lê bersiv nehatiye dayîn. Aliyê Selah Derwîş jî ji Partiya Demokratîk a Pêşverû demeke ji bo nîqaşkirina destûrnameyê xwest."

Ezher Ehmed derbarê xalên destûrnameyê da zanîn ku wê ev xal di nava hemû kategoriyên civakê bên pêşkêş kirin û wiha domand: "Wê hemû xalên destûrnameyên di civînên girseyî, di nava rewşenbîr, siyasetmedarên serbixwe û hemû kategoriyên civakê bên pêşkêş kirin. Dema ku hin pêşîniyarên din jî hebin ji bo xizmeta yekbûna nêrînên çareseriya doza kurdî herwiha yekbûna nêrînên partiyên siyasî dibe ku ev xal bên guhertin."

Ezher Ehmed diyar kir: "Ev destûrname wê ji aliyên peywendîdar ji bo çareserkirina aloziya Sûriya li gorî biryarên navdewletî çi di hundirê Sûriyeyê, naversta herêmê an naversta navdewletî de bê pêşkêşkirin.

Wiha domand: Beriya niha jî nûnerê netewên yekbûyî, koalîsyona navdewletî û dewletên garnator destûnameyeke yekbûyî ji partiyên siyasî re xwestibû, ji ber ku mayîna wan bêyî yekbûna nêrînan wê bandorê li ser doza kurdî li Rojava û Sûriyeyê bike, herwiha wê bandora wê bighêje aloziya Sûriyeyê ji ber ku kurd bûne çareseriya şoreşa Sûriyeyê û kaxizên wê ji bo çareseriya alzoiya Sûriyeyê hene weke rêveberiyên sivîl, saziyên sivîl û leşkerî."

Ezher Ehmed di gotinên xwe de tekez kir ku bi serkeftina komkirin û parêzevaniyê û yekbûna nêrînan ji bo destûrnameyê wê rêjeya serkeftina çareseriyên doza kurdî li Sûriyeyê mezin be ku wê cihê xwe di destûra Sûrî ya pêşerojê bigre.

Endamê komîteya navendî ya Partiya Çep a Kurd li Sûriya wiha dewam kir: "Ya ku ji komîteya amadekirinê tê xwestin ku hewildanên xwe zêdetir bike û rê li ber tu partiyên siyasî negre. Em têkiliyên xwe bi hemû partiyên siyasî re didomînin ji bo li ser xalên hevbeş nîqaş bikin. Partiyên Yekîtiya Niştimanî ya Kurdî gihaşt 20 partî ku li ser tevahiya xalên Destûrnameya Çareseriya Doza Kurdî erêkirin."

Di dawiya gotinên xwe de endamê Komîteya Navendî ya Partiya Çep a Kurd li Sûriya Ezher Ehmed got: "Komîteya amadekirinê bi taybet PYD, Partiya Çep a Kurdî li Sûriya, Partî û Partiya Aştî hewil didin ku ev proje bighêje li dar xistina Konferansekê ji bo hemû partiyên siyasî û hêzên kurdî li Rojava."

'Ji bo demokrasî û azadiyê lidarxistina hilbijartinan gavekî girîng e'

Navenda Nûçeyan

Hevseroka Komîseriya Bilind a Hilbijartinan a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rûken Mele Ibrahîm diyar kir ku pêkanîna hilbijartinên demokratîk ji bo tevahiya pêhateyên herêmê qonaxeke dîrokî ye û got, "Em bang li hemû gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dikin ku beşdarî xebatên hilbijartinê bibin ."

Piştî erêkirina Hevpeymana Civakî di dawiya sala 2023'an de, Meclisa Gel a Demokratîk a Rêveberiya Xweser a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di Sibata sala 2024'an de yasaya Komîseriya Bilind a Hilbijartinan a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê pesend kir û endamên komîseriyê hatin erkdarkirin.

Di 28'ê Adara 2024'an de Komîseriya Bilind a Hilbijartinan a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê civîna xwe ya yekemîn li dar xist. Di civînê de makanîzmaya komîseriyê hat nîqaşkirin û dema destpêkirina hilbijartinan hat diyarkirin.



Komîseriya Bilind a Hilbijartinan 3 nivîsgeh damezirandin û ji bo her yekê hevserok hilbijartin. Ew jî nivîsgeha çavdêrî û îtîrazê, nivîsgeha daîreya hilbijartinê û nivîsgeha perwerdeyê ne. Her wiha logoya komîseriyê hat pêşniyarkirin û ji aliyê endamên wê ve hat erêkirin. Di logoyê de bi 3 zimanan hatiye nivîsandin.

Her wiha komîteyek ji 6 endamên komîseriyê ji bo amadekirina rêziknameya komîseriyê, hat damezirandin. Komîseriyê ragihand ku hilbijartin dê di 30'ê Gulana bê de dest pê bikin.

Derbarê hilbijartina Şaredariyan yên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de hevseroka Komîseriya Bilind a Hilbijartinan a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rûken Mele Ibrahîm ji rojnameya me re axivî.

'Lidraxistina hilbijartinan gaveke dîrokî ye'

Rûken Mele Ibrahîm diyar kir ku avakirina komîseriya hilbijartinê li herêma Rêveberiya Xweser ne tiştekî nû ye, lê hilbijartinên ku ev komîseriya Bilind a Hilbijartinan dê bi rê ve bibe wê li ser asta herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dîrokî bin û wiha domand: "Ji destpêka damezrandina Rêveberiya Xweser ve, tevî hemû êrişîan jî, saziyên Rêveberiyê û pêkhatieyên herêmê dikarîbûn tevahiya pirsgirêkên xizmetguzarî û jiyanî derbas bikin, ji bo xizmeta civakê bibin bersiv û herêmê bi yegirtina gelan birêve bibin. Tevî her tştî Rêveberiya Xweser karîbû xwe isbat bike û bû hêviya gelên herêmê bi giştî. Ji ber vê yekê jî lidarxistina hilbijartinan gaveke dîrokî ye. Herwiha her pêşketinek ku li ser asta Rêveberiya Xweser, ji bo têkbirina êrişan gaveke girînge. Li ser bigeheke demokratîk em ji hemû xetereyên li ser herêmê amade ne, herwiha emê bi hilbijartinên azad û demokratîk saziyên xwe pêş bixin"

'Wê di 30'ê Gulanê de hilbijartin dest pê bikin'

Rûken wiha axaftina xwe domand: "Piştî pesendkirina yasaya Komîseriya Bilind a Hilbijartinan, bi hemahengî li gel sazî û dezgehên mafên mirovan û yên yasayî, girêdayî (Zagona Dabeşkirina Îdarî – Zagona Hilbijartinan – Hilbijartinên Şaredariyan) reşnivîsa yasa hatin nivîsandin. Ev zagon dê di demek nêzîk de ji bo erêkirinê li ser maseya Meclisa Demokratîk a Gelan bin, lê dîsa jî dibe li gorî hin pêwîstiyan guhertin tê de pêk were, ji ber ku hîn jî kar û xebat jê re tê xwestin. Piştî karkirina li ser amadekirina van yasayan, yekemîn civîna Komîseriya Bilind a Hilbijartinan di 28'ê Adarê de hat lidarxistin û tê de Komîseriya Bilind a Hilbijartinan 3 nivîsgeh damezirandin û ji bo her yekê hevserok hilbijartin. Ew jî nivîsgeha çavdêrî û îtîrazê, nivîsgeha daîreya hilbijartinê û nivîsgeha perwerdeyê ne. Her wiha logoya komîseriyê hat pêşniyarkirin û ji aliyê endamên wê ve hat erêkirin. Di logoyê de bi 3 zimanan hatiye nivîsandin. Her wiha komîteyek ji 6 endamên komîseriyê ji bo amadekirina rêziknameya komîseriyê, hat damezirandin. Komîseriyê ragihand ku hilbijartin dê di 30'ê Gulana bê de dest pê bikin."

'Em bang tevahiya gel dikin ku beşdarî hilbijartinan bibin'

Hevserokatiya Komîseriya Bilind a Hilbijartinan ya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rûken Mele Ibrahîm axaftina xwe wiha qedand: "Em bang li hemû gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dikin ku beşdarî xebatên hilbijartinê bibin û ji bo kesên ku dixwazin di van şaredariyan de nûnertiya wan bikin dengên xwe bidin. Herwiha em pêşwaziya hemû rêxistinên xwecihî û navdewletî dikin ku çavdêriya proseya hilbijartinan bikin ji destpêka proseya hilbijartinan heta dawiya wê û em amade ne ku çavdêrên navdewletî amade bin jî dema ku encam werin ragihandin."